

## Dijberîya Rêxistinîyê

Carcaran ez li ser portala X (twiterê) sohbetên cûr be cûr gohdar dikim. Bi rîya teknolojîyê, beşdarî odeyên şevbihrkên modern dibim.

Bi giranî ez dibînim ku piranîya beşdaran û kesên di axifîn li welatên Ewropa dijîn û piranîya wan.........

Dom»R:6



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*


*www.agirimedia.org Hejmar (488)18-02-2025Buha (1000) Tûmen*




## Erkên bo bihêzkirin û geşeya "Hişmendiya Netewî û Niştimanî"

Bo geşe û bihêzkirina hişmendiya netewî û niştîmaniya gelê Kurd ku axa wan hatiye dagîrkirin û tevahiya mafên siyasî û netewî û niştîmaniyên wî gelî hatine binpêkirin, gelek rêkar hene ku mirov dikare mifahê ji wan rêkaran verbigre ku encamên karlêkerên wan hebin û li wir de ezê bi tekezîkirin li ser "Rojhilatê Kurtdistanê" bi kurtî îşare bi çend xalên girîng, berçav û karlêker bikin

Dom» R:4



## Hecetên pêdivî bo hêrişa ser Îranê

Li wan rojên bihorî de bas li wê yekê tê kirin ku Îranê paşkevta ûranyûma meyandî a 60%, gihîştandiye 182 kîlo girem. Ewa li demekê deye ku paşkevta giştî ya ûranyûma Îranê li 6 tonan derbas bûye. Eger Îran her li ser wê esasê berdewam be, yê bo heyva adara 2025an bikare paşkevta ûranrûma 60% a xwe ya meyandî bigihîjîne 250 kîlo gireman.

Dom» R:10

# Peyam û axiftina rêzdar Mistefa Hicrî, Sikirtêrê Giştî ê Hizba Dêmokrat li Kongira 17ê "Kongira Yêkgirtina Dêmokratan" de


**Hevalên hêja!**

**Beşdarbûyên rêzdar ên Kongireya Yekgirtina Dêmokratan(Kongireya 17 a Hizba Dêmnokrat a Kurdistana Îranê)**

**Bi nûneratî ji Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ez bi dilûcan xêrhatinê li we dikim. Li cihê xwe de ye ku pîrozbahiya lidarxistina vê kongireyê ku pêngavek karlêker û dawî wêzgeha proseya Yekgirtina Dêmokratan e, li endamên Hizbê li navxwe û derveyî welat, xelkê Xebatkarê Kurdistanê wek piştevanê hertimî û bingehîn ên Hizba Dêmnokrat, malbatên serbilind ên şehîdan û girtiyên siyasî bikim. Her li vê derfetê de jî silavan bo rihê paqije Şehîdên Hizb û Gel, bi taybet şehîdên piştî yekgirtina refên Hizbê û şehîdên tevgera Jînayê li navxweyê Kurdistanê wek nûtirîn şehîdên karwana serweriya xebat û netewa me dikim.**

**Yekgirtina Hizba Dêmokrat, berhema hewcehiyek dîrokî, xwesta berdewam a cîvaka Kurdistanê, daxwaz û handana dost û dilsozên Hizba Dêmokrat û xebata siyasî-netewiya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bû ku bi îrade û seha berpirsayetî ya rêberî û tekoşerên refên du aliyên Dêmokrat, ser kevt û encama dilxwaz û çavrêkirî li pey xwe anî.**

**Bê şik û guman, hekî lidarxistina vê kongirê li jiyana siyasî û rêkxistina Hizba me de gelek giring û xwedî nirx e, hevdem**



**ew rewşa jî ku Kongire tê de hate lidarxistin, pitir girîng û qedersaz e.**

**li rewşa niha de devera Rojhilata Navîn, karlêkeriya şerê Îsraîl digel Hemas û Hizbullaha Lubnanê û aliyên din ên ser bi rêjîma Îranê li ser heye û rêjîma Îranê jî li jêr bandora wan guherînan de zêdetir ji hertim li siyaseta cîhanî de bi tenê maye û linavxweyê welat de jî rewatiya xwe ji dest daye.**

**Bo hilsengandina rewş û pêgeha siyasî û rewatîdana xelkê bi rêjîma Îslamî, hewcehî bi data û lêkdaneweyên siyasî nake, belkû hilbijartinên nû yên rêjîmê, baştirîn pîvan bo lêkdana pêgeh û cihê rêjîma îslamî li nav xelkê welat de ye.**


**Beşdarînekirina piraniya xelkê li wan hilbijartinan de 2 peyamên rohn li xwe girtibûn: "Ne bi komara Îslamî" û "Erê bo guherîna binyatî".**

Dom» R:2



## Serokê serîhildana miletê Kurd a 1925ê Şêx Seîd û hevalên xwe îro jî rêya me rohnî dikin

Dom » R:8



## Zihniyeta desthilata nû ya Sûriyê

Dom » R:9

# Beşdarbûyên rêzdar ên Kongireya Yekgirtina Dêmokratan(Kongireya 17 a Hizba Dêmnokrat a Kurdistana Îranê)

**Doma R:1**

Ew rêjîma mîratgirê desthilatariya rêjîma navendgira a Pehlewî ye ku li ser bingeha nasyonalîzma Îranî hatiuye avakirin, nasyonalîzmek ku ti car îtiraf bi çendîn netewîbûna civaka Îranê nekiriye.

Îran welatek çendîn netewî ye û bi berçavgirtina vê rastiyê li avakirina Îranê, bi taybet li dîroka sedsaleya derbasbûyî de sedema bingehîn a hemû pirsgirêk û qeyranên ku îro pêpsîra xelkê welat û opozîsiyona komara Îslamî girtiye.

Rêjîma Îslamî ji aliyekê cehd kiriye ku seha netewî li nav kurdên Şîe lawaz bike û ji aliyê din ve dijayetiya olî û tundajotiyê li nav Kurdên Sunnî, berfireh bike, hevdem bi berfirehtirkirina qlîşên li navbera olên din wek Yarsan, rê ji çêbûna qewareya yekîtî ya netewiya Kurd bigre.

Lê hişariya siyasî û netewiya Kurd ji aliyekê û stratejiya Hizba Dêmokirat ji aliyekî din ve ku bihêzkirina seha netewî û rawestan li meydanê li hember siyasetên rêjîmê bûye.

Bilindbûna she û hişariya netewiya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, li çend bûyerên wek erdhheja li "Ezgele û Serpila Zehaw"ê li parêzgeha Kirmaşanê û lehiya li Luristanê û hilkeftên netewî yên wek "Newroz"ê de nîşaneya asta herî bilind a hişariya siyasî û netewiya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de bûn.

Rêûresmên Newroza îsal anku sala 1403 a Rojî ku bi şaneke bêmînak bi rê ve çon, ji aliyekê nîşanderê îrade û seha bihêz a niştimanperweriya Kurdan bû û ji aliyê din ve jî heta asteke berçav li amadehiya hizrî û meydanî ya xelkê Kurdistanê bo xebat û serî hildana medenî û giştî de li dijî rêjîma Îslamî çavkanî girtiye.

wan hilkeftan da xuya ku pirsa rêkxistin û nasnamexwaziya Kurd li çarçoveya xebata medenî û giştî de qonaxeke zêdetir derbas kiriye û asta têgihîştin û reftara siyasiya xelkê Kurdistanê hinde bilind e ku li asta Îranê de dibe wek mînak bê hesibandin.

Li wî heyamî de serhildana "Jîna"yê ku li Kurdistanê ve bi dirûşma "Jin Jiyan Azadî"yê serî hilda, derfet û rewşek wiha afirand ku piraniya aliyên Îranî bi taybet civaka jinan a Kurdistan û Îranê, xwe li vê tevgerê de dîtin.

Ev serîhildana ku rûkê siyasiyê Kurdistan û Îranê guherand, rola malbatên şehîdên tevgera "Jîna"yê, bazarî û dukandaran, pizîşkan, mamostayan, kesayetî û êlîtên siyasî û civakî, jinan, nûgihan û ciwanan, xwendekaran bi qutabiyan ve, mamostayên olî yên dilsoz li Kurdistanê û herwisa Kurdên derveyê welat, xuya û xwedî nirx bû ku pêwîste Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê hem bala taybet bide ser wan, û hem ji şiyan û kêrhatina wan bo pêşxistina pirsên qatên cuda yên civakê û rêkxistin komkirina hêza xebatkariya wan mifahê verbigre.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê wek hertim, li ser vê baweriyê ye ku pirsgirêka Îran û civaka cîhanî, nabe li pirsa navkî û mûşekiya komara îslamî û bi vê pêkê li Bercamê de bê sînordarkirin.

Pirsgirêka bingehîn a komara îslamî, vekirînebûna vê rêjîmê li çarçoveya sîstema cîhanî, îdeolojiya rêjîmê û aliyên girêdayî yên vê bo berfirehtirkirina terorîzma hikûmî û alozkirina rewşa deverê ye.

Herwisa pirsa navxweyê Îranê, zordariya siyasî û bi barimtegirtina xelkê welat û serkut û binpêkirina maf û azadiyên vê ye ku civaka cîhanî li reftara siyasî digel Îranê de dibe bê dîtin.

Dîtingeh û nexşerêya Hizba Dêmokrat bo Îrana paşerojê, bi tewahî rohn û xuya ye.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi pêdegirî li ser vê ku Îran welatek çendîn netewî ye, li ser vê baweriyê



ye ku sîstema siyasiya federalîzm dabînkerê hevpariya pêkhateyên netewî, olî û curbicuriyên din ên wî welatî ye.

Bo komkirina hêza xebatkariya hemû netewan li Îranê bi armanca derbasbûn ji komara Îslamî jî hewce ye ku hevpeymaniyek li navbera wan hemû hizbên pêşkevtinxwaz ên seranserî û deverî û rêkxiravên medenî li navxweyê welat de bê avakirin.

Hizba Dêmokrat li ser vê bawerê ye ku bi ezmûnvergirtin ji şaşî û kêmasiyên pêştir, bi rêgirîkirin ji komek ji diyarokên nerênî û nerind, bi rexnegirtin û vergirtina rexneyan û eşkeregotina rêberî û endaman li navxweyê Hizbê de bi guherîn û nûkirina kultûr û sîstem û şêwaza hizbatiyê û karkirina bi hev re, bi afirandina rewşekê bo karkirina kesên bi wec, bi afirandina seha berpirsayetî li asta yekgirtina Hizbê û biryarnamên pejirandiye vê, bi perwerde û hinkariya modern a kesan bi seha pevrebûn û rêzgirtin ji curbicurî û cudatiyan, bi afirandina rewşekê ku hemû kes ya xwe bizane, qeyran û pirsgirêkên navxweyî kêm dibin û têne çareserkirin.

Hewceye ku Hizba Dêmokrat li navxweyê welat de bi xebata medenî û giştî li hembner rêjîmê bisekine û li derveyê welat de bi rêya dîplomasî û bi taybet li Îraqê de bi danûstandin digel aliyên pêywendîdar, pîlanên rêjîmê pûç bike.

Karê hizbatî ya herî girîng li derveyê welat jî dibe bo destkevtên dîplomatîk bi qazanca Hizb û pirsa nasnamexwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, rêkxistina teşkîlatî ya bi dîsîplîn, bi hêz û xweragiriya Hizbî be.

Lewma pêdeçon bi organîzma Hizbî û çawatiya karê me yê Hizbî bo gihîştin bi wan armancan, dibe ku li bernameya karê me be.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, pêdagiriyê li ser vê yekê dike ku tevî piştevanîkirin li pirsa mafxwaziya rewaya gelê Kurd li beşên din ên Kurdistanê, Rojhilatê Kurdistan û Îranê bi meydana bingehîn a xebat û erkê dîrokiya xwe dizane, Lewma tevî bi armancgirtina tevahiya desthilata komara Îslamî, bo bihêzkirin û rêkxistina zêdertir a xebata giştî li Rojhilatê Kurdistanê hewlê dide û li hewlên xwe bo çêkirina hevpêywendiya zêdetir digel netewe û aliyên din ên siyasî yên Îranê dide.

Navenda Biryar a Hizbê û organîzma Hizbî, bi taybet li beşên teşkîlat û ragihandin, bi nirxdaneke zêdetir li deverên bakûr û başûr ên rojhilatê Kurdistanê û deverên kurdnişîn ên derveyê Rojhilat, hewla zêdetir bo aliyê xebata netewî û nasnamexwaziyê li wan deverên Kurdistanê û bihêzkirina pêgeha siyasiya Kurd li Îrana pêşerojê didin.

Hewce ye, teşkîlat û organîzma me li navxweyê welat û derve bi şêwazekê bê rêkxistin û nûjenkirin ku jîngehek bi wec, hivîder û armancdar bo beşdarîkirina hemû kesên civaka Rojhilatê Kurdistanê li navxwe û derve, çê bike.

# Gotara Xalid Ezîzî li rêûresima destpêkirina kongireya yekgirtina Demokratan

**Hevalên hêja, nûnerên rêzdar yên kongreyê**

Bixêr hatine bo kongireya yekgirtina Demokrtan, kongireya vê crê li demekê de tê lidarxistin ku Hizba me, yanî Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê pêngav havêtiye nav 80mîn sala avakirina xwe de. Her ji ber vê ye ku beriya her tiştî silavan dişînim bo rihê pak yê şehîd Pêşewa Qazî Mihemed, avakerê Hizba Demokrat û yekemîn Serkomarê Kurdistana Îranê ku bi avakirina Hizba Demokrat a Kurdistanê û herwisa ragihandina Komara Kurdistanê, bingeha nasyonalîsim û desthilatdariya serdemiyane ya Kurd li Rojhilatê Kuridstanê danî. Silav li riha pake şehîdê rêber, Dr. Ebdulrehman Qasimlû ku di heyama 8 dehkan a xebata û xweragiriya Hizbê a Demokrat de cane xwe bo gihîştin bo azadiyê gorî kir. Silav li hemû endam, kadir û pêşmergeyên Hizba me, malbatên şehîdan û girtiyên siyasî ku îlhamderê xweragirî û hêviya serkevtina xebata gelê me ne, silav û pêzanîn ji bo hemû têkoşer û xort û keçên nîştiman ku tevî nirxên giran yên xebata mafxwazan e, lê li çeperên corbicor yên xebata nasnamexwaziya Kurd li Rojholatê Kurdistanê çalak in.

**Amadebûiyên qedir giran yên Kongirê!**

Bêguman lidarxistina kongirê yek ji bûyerên girîng yên Hizba me ye û derfeteke ji bo pêdaçûn li siyaset û stiratîjiyên Hizb û xisarnasiya karkirina Hizbê di derbasbûyê de, herwisa zindîbûn û pejirandina nexşerêiya nû ya meydanê bo paşeroja kar û têkoşîna Hizba me. Mixabin herçawan ku hûn dizanin di kongireya vê carê ya me de derfeta vê yekê nehate pêş bo hemûyan bihevre û di yek cihî de kom bibin. Lê hivîdar im tevî vê yekê ku kongireyeke tijî li destkevt me hebe û rêberiya paşeroja Hizba me li birêvebirina erkên destnîşankirî yên me di kongireyê de berdewam dibin.

**Hevalên hêja!**

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ku niha nûtirîn kongireya xwe lidar dixe her Hizba duh e, li ser hitbara vê yekê di 8 dehkan xebat û têkoşînê de gelek destkevt û serbilindî ji bo tevgera neteweyî a Kurd tomar kiriye ku niha sermayeke binirx a siyasî ye bo me.

Hizba îroyî ye, li ser hitbara vê yekê di rewşa gelek hestyar a Rojhilat a Navîn û di nav alozî û kirîzan de bi jîrî siyaset û helwestên bicih û hewl û îradeya bikom a endaman kariye li ser pê xwe bimîne û li ser rêbaza xwe berdewam be.  Hizba Demokrat raspardeyên vê kongireyê di jiyana siyasî û xebata meydanî a xwe de berdewam dibe. Her ji ber vê yekê ye armanca destnîşankirî ya me ji bo vê pênaseyê ev jî sê qonaxên zemanî ya coda de erka girîng û armanca destnîşankirî bo me destnîşan dike ku dive bi yekgirtî û bi hewl û têkoşîa hemû alî ber bi bidestveanîna van bimeşin.

Yek ji sebebên xweyabûn û konkirêt bûna xebata siyasî û neteweyî ya Kurd di Rojhilatê Kurdistan û li ser pêbûna tevgera vê jî bo lidarxistinbûna xebata siyasî ya Kurd li Îran û hebûna Hizba xwedî ezmûn û xebatkar wek Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê vedigere, û ev yeka jî di cihê xwe de erkeke girîng dixîne ser milê me ku ev Hizba me bi bihêzî bimîne û bo vê mebestê jî dive em hemû li xema parastina yekrêziya Hizba xwe de bin.

Yekgiritna Demokratan berhema daxwaza xelkê Rojhilatê Kurdistan û herwisa îradeya bihêz a me tev endamên Hizbê bo bidestveannîa vê armancê bû. Bi baweriya min yekgirtina

Hizba Demokrat îhsasa bêsînûr a berpirsayetiyê li hûndir de hebûye ku ji aliyê xelkê Kurdistanê ve wek erk xistiye ser mile me û em jî bi erkê ve digihîjin bi armanc û ji bo vê ku li paşerojê de hê bandora zêdetir a me li ser rewta guherînkariyên Kurdistan û Îranê hebe, dive vê yekgirtinê biparêzin.

**Hevalên hêja!**

Hizba me di heyama 8 dehikên derbasbûyî de tevî bidestveanîna gelek destkevt û afirandina gelek şanazî di jiyana siyasî a me de, lê di birêveberî û îdarekirina Hizba me de bê şaştî û kêmasî jî nebûn e. xûya ye wirda Hizbeke mezin û dîrokî wek Hizba Demokrat ku hezaran endam û dehan kadir û pêşmerge û dehan endamên rêberî li warên cuda yên siyasî û teşkîlatî de dixebit ni, renge şaştiyan jî bikin û bê rexene kirin jî. Lê, dive em şaşiyên xwe bibînin û bi riheke rexnegirane xisarnasiyê bikin û bo nehêlan û çareserkirinan pilana me hebin.Em her bi wî coreyê bera xwe bidin bi vê veqetîna me ya berê û me qebûl kir ku di vê veqetînê de ji hemû aliyan berpirsayetî dikeve ser mile me û ti aliyek ji me bê şaştî nebûne û niha jî ku bi merema kareke mezintir in, dive vê diyardeyê nehêlin û bi yekgirtina me vê serkevtina xwe tomar bikin.!

**Hevlên hêja!**

Her ji ber vê yekê ye li pêxema dûbarenebûna vê rewşa han di paşerojê de bila em bi bawer û biryar û qenaetê cem tak bi takên xwe û hemiyan dirûst bikin ku di egera serhildana her core pirsgirêkekê de ku normal e di rewta jiyan û têkoşîna Hizbê de bên pêş, di çarçoveya teşkîlatî û li gorî rêniwîniyên navxweyî û rihê parastina yekîtî dikarin çareseriyekê ji bo bibînin û nabe li derveyî organ û li derveyî Hizbê de li pey çareseriyê bin.



**Endamên rêzdar yên kongireya yekgirtina Hizba me!**

Kongireya me di demekê de tê lidarxistin ku Komara Îslamî ya Îranê piştî derbasbûna 46 salan ezmûnên şikestxwarî di birêveberiya welat de êdî di hemû waraên siyasî, aborî, dîplomasî û birveberiyê de gelek lawaz bûye, li alî vê bi sedema kombûna kirîzan di navxweyî welat de rûbirûyî nerizayetiyên berfireh yên xelkê bûye û di asta navçe û hevkêşeyên navdewletî de jî siyasetên wê hilweşiyan e.Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê mîna ku heta niha pişka herî zêde ya rêberîkirina hereketên siyasî û neteweyî yên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de pêngavan dihavêje, hevdem digel berdewmiya me di vê erkê û berpirsiyasetê de ji bo qahîmkirina hereketê, bo paşeroja Îranê jî bê xem nabin. Bihêzkirina hizra dirûstkirina kom û encûmen û damezravên cuda yên medenî û nasnamexwaze rêçareyeke hewce ji bo vê ku xelkê me li navxweyê welat de bi amadehî rûbirûyê sinaryûyên beriya hilweşîn û piştî hilweşîna vê rejîmê bibin. Her ji ber vê yekê ye beriya paşeroja Hizbê dive di bin ronahiya behs û biryar û pejrandinên kongirê û ezmûnênê xebata çendîn salî giraniyê bixne navxweyî welat de.

**Hevalên hêja!**

Hizba me di heya 80 sal temen û têkoşînê de gelek ewraz û nişîv ezmûn kiriye, û çend caran astengî dîtiye û qonaxên gelek dijwar derbas kirine, yên wek îdamkirina Pêşewa Qazî Mihemed avakerê Hizbê, wek terorkirina du sekreterê Hozbê şehîdan Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û herwisa teroro û şehîdkirina dehan rêber û hezaran kadir û pêşmerge, heta di heyama çend salên derbasbûyî de çendîn caran bi mûşek û dronan êrîşî li ser baregehên me kirin e, lê vê Hizbê xwe neçemandiye û nekevtiye qedeman û kariye bimîne û xebat û têkoşîna xwe berdewam bike û vê yekgirtinê jî bihêztir kiriye.

Sedemê vê meydanêdemanê û berdewamiyê jî vedigere bo piştewaniya hemû alî ya xelkê Kurdistanê ku di hemû qonaxên têkoşîna Hizibê de digel bûne û bi tijî kirina valahiyan û meydandariya qada xebat û xweragiriya Hizba Demokrat, germ ragirtiye.

**Endamên rêzdar yên Kongireya Yekgirtina Demokratan!**

Bername û pêrewa navxweyî a Hizba me di gelek aliyan de rêçare û pilan bo kar û têkoşîna me destnîşan kiriye. Hem di destnîşankirina çarenivîsa pirsa Kurd di Îranê de û hem li aliyê têkoşîna navxweyî di çarçoveya dîsîpilîna destnîşankiriyên Hizbê de. Her ji ber vê yekê li pêxema ber bi pêşveçûna xebatê û hevdem armancên Hizba me de, herwisa cora danûstandin û reftarên digel hevdu di navbera me bixwe de û digel tak û aliyên din de, hewceye pêbendê pêrewa navxwe bin û bi berçavgirtina vê mikanîzim û disêplênê encam bidin. Ji bo vê mebestê jî rêberiya paşeroja Hizbê hewceye çi ji aliyê perwerdehiyê û çi ji aliyê çavdêriyê û mifah wergirtin li torên civakî, mikanîzim û çarçovya guncaw ji bo kêmkirin ziraran û bilindkirina ast û şiyanan di vê pêywendiyê de destnîşan bike.

**Di dawiyê de:**

Em hemû alî heta asteke gelek zêde ev qenaeta me heye ku Hizba Demokrat nifûzeke cemawerî ya zêde û bihêz heye û yekgirtinê jî ev pêgeha bihêztir kiriye. Lê, Hizba Demokrat dive gelek ji vê yekê bihêzitir bibe û ji bo vê yekê jî hewcehî bi xelkek zêdetir û piştewaniya zêdetir heye. Divê hiloşîna Komara Îslamî jî bikin pirojeya hevpar a hemû pêkhateyên Îranê. Her ji ber vê mebestê jî divê bi corekê siyasetê bimeşînin û bi şêweyekê hereket bikin ku piştewaniya me zêdetir û dijminên me kêmitir bibin. Her di vê çarçoveyê de bixasmanî dinavbera hemû aliyên Îranê de me hewcehî bi dost û hevparên zêdetir heye.

Hêvîdarim karê kongireya me li gor destûra karê destnîşankirî û bi serkevtî ber bi pêşve her in.

# Erk ên bo bihêzkirin û geşeya “Hişmendiya Netewî û Niştimanî”



**N. Bêhzad Qadirî**
**W. Bêhzad Simko**

Bo geşe û bihêzkirina hişmendiya netewî û niştîmaniya gelê Kurd ku axa wan hatiye dagîrkirin û tevahiya mafên siyasî û netewî û niştîmaniyên wî gelî hatine binpêkirin, gelek rêkar hene ku mirov dikare mifahê ji wan rêkaran verbigre ku encamên karlêkerên wan hebin û li wir de ezê bi tekezîkirin li ser “Rojhilatê Kurtdistanê” bi kurtî îşare bi çend xalên girîng, berçav û karlêker bikin

**Hînkarî, perwerde û agehdarkirin**

**Dîroka rastîne Kurdistanê-** li ber vê ku Rojhilatê Kurdistanê hatiye dagîrkirin, derfeta hînkarî û baskirin ji dîroka Kurdistanê wek waneyek li sîstema perwerde li xwendingeh û zanîngehan de nîne, lewma dibe bi rêya ragihandin û torên civakî, bas ji dîroka rastîn a Kurdistanê, xebata gelê Kurd û sitemên ku li Kurd û Kurdistanê hatinî kirin, bêne rohnkirin û şirovekirin da ku nivşa nû ji dûriya ji seha netewî û dîrokî, biparêzin.

**Cografiya-** sinûr û welatê Kurdistanê, cografiya, sînor, nîştiman û çavkaniyên ser erd û bin erd ên Kurdistanê bi xelkê bi taybet nivşa nû bêne nasandin û bas ji giringiya vê mijarê li talankirina welat ji aliyê dagîrkeran ve bê kirin.

**Çanda Kurdî-** geşe û girîngîdan bi çanda Kurdî, ên wek “ziman, wîje, mûzîk, govend û dîlan, cêşna netewî a(Newroz) ê, kinc û deb û adetên Kurdî” û baskirin ji girngiya wan bo nasnamexwaziya me, hewce ye û dibe bi berdewam tekezî li ser bê kirin, ev bi xwe berteknîşandaneke jî li hember siyaseta helandin a dagîrker li dijî gelê me ku dixwazin me li nav xwe de bihelînin anku asimîle bikin.

**Ragihandinên Kurdî-** avakirin û piştevanîkirin li torên civakî û ragihandinên Kurdî (TV, Radyo, rûpel û torên civakî) ku bi zimanê Kurdî û zimanên din bas ji pirsên pêywendîdar bi Kurd û Kurdistanê dikin, bi taybet pirsên niştîmanî û netewî.

**Weşan-** Çap û belavkirina pirtûk, govar, rojname û … hd, bi zimanê Kurd û zimanên din li derheq dîrok, cografiya, çand, siyaset û pirsên pêywendîdar bi Kurd û Kurdistanê.

**Rêkxiravên medenî-** avakirin û piştevanîkirin li rêkxiravên medenî anku xelkî ku li warên wek “mafê mirov, çand, perwerde, wêje, jîngeha Kurdistanê û … hd, çalakiyan dikin.

**Çalakiyên çandî û hunerî:**

**Cêşn rêûresm-** Birêvebirîna cêşn û dab û resmên çandî û netewiyên Kurdan, wek Newroz, bi şêwazeke bi şan û bi beşdariya berçav a xelkê û bikaranîna hêmayên netewî û rênedan bi hêmayên dagîrkeriyê li wan cêşn û resman de.

**Şano û sînema-** Berhemanîn û belavkirina fîlm û şanoyan ên ku bas ji pirsên pêywendîdar bi Kurd û Kurdistanê dike û bas ji dîrok û çand û nasnameya Kurdistanê dikin. (Li vê derheqê de Başûrê Kurdistanê xwdî potansiyeleke baş e û dikare alîkarê beşên din ên Kurdistanê be jî)

**Mûzîk û govend-** Piştevanîkirin li hunermendên Kurdistanî û dilsoz û birêvebirina konsert û hunermendan û jenyarên mûzîkê û girûpên govendê. Herwisa agehdarkirina wan girûpên hunerî ku bi ti awayekê li rêûresmên hikûmî de beşdar nebin.

**Rêkxistina Foar û pêşangeh-** lidarxistina foar û pêşangehên hunerî û çandî yên Kurdî ên cur bi cur li Kurdistanê û welatên din ên cîhanê. (hejmareke zaf ji xelkê Kurd bi taybet li welatên Rojavayî de dijîn)

**Çalakiyên siyasî:**

Hizb û rêkxiravên siyasî- endambûn û piştevanîkirin li hizb û rêkxiravên siyasî yên Kurd û Kurdistanî ku bo serweriya siyasî û mafê diyarîkiirna çarenivîsa gelê Kurd, xebatê dikin.




**Çalakiyên medenî-** Piştevanîkirin û beşdarî li çalakiyên medenî û kombûnên medenî bo nîşandana xwest û daxwaziyan û nîşandana nerizayetiyê li hember sitem û cudatîdanînan.

**Pêywendî digel cîvaka navnetewî-** pêywendî digel rêkxiravên navnetewî û welatên din bo agehdarkirina wan li derheq rewşa Kurdan û hewladn bo rakêşana piştevaniya wan. Herwisa agehdarkirina xelkê Kurdistanê ji wan hewl û çalakiyan.

**Geşeya hevpeywendiya netewî-** pêkanîn û geşedan û bihêzkirina hevpêywendî û hevgirtina li navbera Kurdistaniyan hem li Kurdistanê û hem li derveyî Kurdistanê anku diyasporayê. (li vê derheqê de hizb û rêkxirav û encumenên Kurdistanî dikarin bi baştirîn şêwazê, çalakiyan bikin)

**Geşeya aborî û civakî:**

Geşeya aborî- Hewldan bo geşeya aborî ya Kurdistanê û afirandina derfeta kar bo cîwanan bi rêya xwedî sermayên welatparêz ên Kurdistanê.

**Geşeya demdirêj-** nûjenkirin jêrxanên Kurdistanê, bi taybet xwendingeh, nexweşxane û navendên çandî ji aliyê xwedî sermayeyên welatparêzn ên Kurd.

**Piştevanîkirin ji werzêran-** pişêtevanîkirin li werzêran li Kurdistanê û pêkanîna derfetên hewce bo geşekirina werzigariyê.

**Têbînî:** Aboriya bihêz bo wan çalakiyên ku bi armanca geşedan û bihêzkirina hişariya netewî û niştimanî têne kirin, hewcehiyek hestiyar e.

**Parastin û nûjenkirina şûnwarên dîrokî û çandî:**

Parastina şûnwarên dîrokî- Hewldan bo parastin û nûjenkirina cihên dîrokî yên Kurdistanê ku nîşanderê nasname û dîroka wî gelî û welatî ye. (li vê derheqê de hewcehî bi rêkxiravên xelkî û medenî û piştevanîkirina malî ya xwedî sermayeyên welatparêz ên Kurd heye)

**Nûjenkirina cihên olî û çandî-** Nûjenkirina cihên olî û çandî yên Kurdistanê ku bi sedema siyaseta cudatîdanîn û asmîlasiyona dagîrkeran ve, hatine kawilkirin an bizanebûn hatine piştguh avêtin, her wek şûnwarên mirovî, hewce ye.

**Encam:**

Hewceye ew çalakiyane bi awayekî berdewam û pêdegirane, ji aliyê hemû qatên civaka Kurdistanê ên wek “Rewşenbîr, hunermend, çalakvanên siyasî û civakî û medenî û heta xelkê asayî yê Kurdistanê) bêne birêvebirin, da ku karlêkeriya erênî bi sr hişmendiya netewî û niştîmaniya Kurdistanê bike û rizgarbûna me ji dagîrkariyê zêdetir dabîn bike.

# Pêgeha zimanê kurdî weke zimanê zikmakî di şûnasa neteweyî û xurtkirina tevgera rizgarîxwaxiya Kurdistanê de



N. Serbest Urmiye

**Beşa 1**

**Destpêk-** di warê nasname û nasandina şunasa takekesî, civakî û neteweyî de, ziman weke faktereke bingehîn tê hijmartin. di herdu dîtingehên zanist û felsefeyê de, ziman tenê alavê gotûbej û têkilîyan nahê dîtin , belkû platformek e ji bo pêkhatina raman, nasname û hevgirtina civakî û neteweyî.

Li gor dîtina derûnnasê naskirî "Erik Erikson"ê bi esil Amaniyayî, nasnameya takekesî ji têkiliyên civakî û çandî pêk tê û ziman jî yek ji emrazên herî girîng ên van têkiliyan e.

Ji ber vê yekê di warê serxistina pêvajoya şûnasxwaziyê di astên cur bi cur di hindur yekîneyeke neteweyî de, zimanê dayîkê ji bo her kes û neteweyekê yek ji hêmayên bingehîn ên nasnameyê tê hesibandin û di aliyên takekesî, mirovî, neteweyî û civakî de roleke sereke digêre.

Zimanê Kurdî jî weke zimanê zikmakî yê neteweya Kurd di dirêjahiya dîrok û pêvajoya tevgera şûnasxwaziyê di Kurdistanê de roleke bingehîn di parastina nasnameya çandî, civakî û neteweyî ya vî gelî de hebûye.

Di vê gotarê de, li ser bingehên hizrên zanistî û felsefî, hewil hatiye dan ku pêgeha zimanê dayikê( bi esasgirtina zimanê Kurdî) di pêvajoya serxistina nasname û yekîtiya civakî û neteweyî de û her wiha bandora wê ya li ser berxwedana çandî, civakî, siyasî û neteweyî di Kurdistanê de were bas kirin.




### 1. pêgeha Zimanê zikmakî di nasnameya takekesî, çandî û civakî de

#### 1.1. Ziman û nasnameya takekesî: di ranamên derûnnasî û felsefî de.

Li gor dîtina derûnnasan, ziman di pêkhatina hizir û kesayeta mirov de rola bingehîn dibîne. "Noam Chomsky"feylesofê zimannas ê Emerîkî, ji ziman tenê weke emrazê ragihandin û gotinê mêze nake, di baweriya wî de ziman beşek ji pêkhateya zanist, fêrbûn û ramana her kesî/ê ye. "Martin Heidegger" feylesofê Almaniyayî, ziman emrazê têgihîştin ji hebûn û cîhanê dide nasandin. Li gor pênaseya han, zimanê zikmakî (yek ji wan zimanê Kurdî) alîkarê mirov e ku bi hilgirtina nirx û hêmayên xwe yên çandî û civakî, kesayetî û nasnameya xwe li hember mirov yan takê din de ava dike û biprêze.

#### 1.2. Ziman û Nasnameya Çandî: di qada dîrok û hizra giştî de

Zimanê zikmakî mîrateke çandî û dîrokî ye ku ji her neteweyekê re dimîne. Feylesofê Fransî "Paul Ricoeur" nasnameya mirovî, bîreweriyên dîrokî û serpêhatiyên çandî bi hev re girê dide ku di vir de zimanê dayîkê navenda veguhastina wan hizir û bîreweriyan e û heke zimanê dayîkê nebe nasnameya dîrokî û çandî ya gel winda dibe. Zimanê Kurdî jî di Kurdistanê de çîrok, nirx û baweriyên civakî yên Kurdan parastine û bûye bingehek ji bo fêmkirin û têgihîştinê ji têgehên weke azadî, wekhevî û dadperweriya civakî.

#### 1.3. Ziman û nasnameya civakî: faktera hevgirtin û têkiliyên giştî

Civaknas "Emile Durkheim" ê Firansayî, ji aliyê civaknasiyê ve ziman yek ji hêmayên bingehîn ên afirandina hevgirtina civakî dide zanîn. Di civakên kevneşop parêz de, ziman çand, edet û baweriyên hevpar vediguhêze û di civakên nûjen de jî ziman alavê ragihandin, siyaset û beşdariya civakî ye. Her di vê derheqê de "Michel Foucault" jî dide zanîn ku ziman di avakirina nasnameyên civakî û parvekirina hêz û desthilatê de roleke bingehîn digêre. Di vê qadê de zimanê Kurdî jî ji bilî ragihandinê, yê bûye faktereke sereke ji bo yekîtiyê di navbera komên cuda yên Kurdan li seranserê herêmên Kurdî û li dîasporayê.

### 2. Zimanê zikmakî û rola wê di avakirina netewe û yekîtiya civakî de

#### 2.1. Zimanê zikmakî û xurtkirina yekîtiya civakî

"Benedict Anderson" ê Emerîkî di vê baweriyê de ye ku netewe di rêya zimanekî hevpar weke "civakeke xeyalî" ava dibin û piştre zimanê hevbeş hest û hevgirtina civakî bihêz dike û dibe sebeb ku nasnameyeke hevbeş yan neteweyî peyda be. "Jürgen Habermas" jî bi heman awawî girîngiyê dide bandora ziman di afirandina nasnameya hevpar û yekîtiya civakî de. Li gor ramanên han di Kurdistanê de zimanê kurdî weke zimanê hevpar faktora sereke ya yekîtiya civakî ye di navbera komên cuda yên kurdan de û weke sembola berxwedan û nasnameya neteweyî tê zanîn û nirxandin.

#### 2.2. Zimanê zikmakî di pêvajoya avakirina neteweyî de

"Benedict Anderson" di berhema xwe ya bi navê "Civakên Xeyalî" de şirove dike ku netewe pêkhateyên civakî ne ku di serî de bi rêya ziman, medya û rêkxistinên çandî de hatine avakirin.

Di qada Kurdistan ê de jî zimanê Kurdî ji bo Kurdan sembola nasnameya netewî û amûreke parastin û ragihandina çand, dîrok û wêjeyê ye. Ji ber ku gelê Kurd him li ser axa xwe hatine parvekirin û him jî di welatê bîhanî de niştecih bûne, tekoşîna wan ji bo bihêzkirin û parastina zimanê Kurdî li hember siyaset û hewlên serkutkirinê de yê bûye beşeke sereke ya berxwedana siyasî, çandî û neteweyî ya gelê Kurd.

# Dijberîya Rêxistinîyê





N. Cano Amedî

Carcaran ez li ser portala X (twiterê) sohbetên cûr be cûr gohdar dikim. Bi rîya teknolojîyê, beşdarî odeyên şevbihrkên modern dibim.

Bi giranî ez dibînim ku piranîya beşdaran û kesên di axifîn li welatên Ewropa dijîn û piranîya wan, demekî bi şeweyekî, di nav refên rêxistinekî de kar kirine, zehmetî dîtine, keda xwe bê şert û merc radestî rêxistinên xwe kirine û beşek jiyana wan di nav refên rêxistinekî de derbas kirine; an jî birîndarê sazîyekî, rêxistinekî, partîyekî ne!

Ji ber ku derûnîya birîndarîyê li ser wan trawmayên giran çêkirîye. Di axaftinên xwe de, di nirxandin û şîroveyên xwe de hişmendîya dijberîya rêxistinbûyinê derdixin pêş. Weke ew kesên ji darê zirar bibînin hemû daristanê didin ber şewitandinê.

Ji ber ku bala xwe li ser darekî kom dikin, demek şûnda daristanê nabînin. Ev jî rê li ber nirxandin û şîroveyên rasteqîn dixetimîne. Ev şêwe jî axaftvan ji armancên xwe dûr dixe û rê li ber gengeşîyên vala xweştir dike.

Divê her kurdistanî baş bizanibe ku heta îro sebebê em bi serneketine! Yek jê jî, ji ber ku tunebûna hişmendîya netewî û bêrexistinbûyina milletê Kurd bûye! Heta îro ew rêxistin û organîzasyonên me yên ser stratejiyek netewî tevgerîyaye kêm in an tune bûye. Hewldanên çê bûne heremî, demkî an loqal mane.

Piranî bi hişmendîya bayê demê tevgerîyane an jî bi perspektîfa têkoşîna çînî, xwestine kar û xebatên doza netewî bidomînin. Herkes dizane ku gava bişkoka pêşî bi şaşî bê qefilandin wê yên din jî şaş bênqefilandin!

Dîrok daye îspatkirin ku civat û netewên ji organîzasyon û rêxistinbûnê bêpar in her dem ji azadî û mafê desthilatdarîyê, ji hûqûq û edelatê dûr in.

Di van salên dawî de em hemû baş dizanin ku ji ber bêrêxistinbûnê û ji ber bêhêzbûna xeta netewî suwarên xirab li ber derîyê me hespên xwe bezandine. Me kêmasî û şaşîyên xwe bin palas kirine û dest bi gilî û gazinan kirine.

Divê herkes baş bizanibe rêxistina herî xirab ji bêrêxistinbûnê çêtir e. Gava mirov bixwaze û hewl bide dikare di şûna ya xirab de ya baştirîn ava bike, biguherîne, an alternatîfek nû peyda bike. Ev mafê her kurdperwerekî ye.

Heqaret, bê rêzî û dijberîya rêxistinbûyinê ne helwestek niştimanperwerî ye. Divê ji bo hêzbûna rêxistinekî netewî em piştgirên doza netewî bin. Ev jî li gorî şert û îmkanan, li gorî cîh û demê bi şêweyekî em keda xwe bixin nav kedek hevpar.

Divê em bi hevre, bi hişmendîyek netewî, bi hestên milletbûnê sînerjîya xwe reorganîze bikin û ber bi encamên dewletbûnê ve bimeşin.

Hemû milletên bindest bi rêxistin û organîzasyonên milî têkoşîna xwe meşandine û bi ser ketine.

Em jî dizanin ku sir û formula serkeftinê girêdayî hebûna hişmendîya netewî û bi hêzkirina stratejiyek milî ye.

Rêxistinbûn ne tenê ji partî, tevger, derdor an grûban pêk tê.

Di hemû beşên jiyanê de pêwîstîya hebûna rêxistinbûnê ferz e! Di warê siyasî, civakî, aborî, çandî û jiyanek Kurdewarî de hemû şêweyên rêxistinbûnê pêwîst e!

Ji bo aborîyek milî, ji bo mejûyek netewî, ji bo hest û bertekên milî pêwistîya me bi aqlê kurdî heye. Ji ber wê yekê divê em portal û dikên medyaya civakî ji bo hêzbûna hişmendîya netewî û avakirina rêxistinbûnên milî bi kar bînin.

Em hevdû gohdar bikin û hevdû fam bikin. Divê em bi hevra hewl bidin ku li şûna “aqlê protez” aqlê kurdî desthilatdar bikin.

Qet nebe em dikarin li ser dîroka Cuhîyan serê xwe biêşînin û ji dîrok û hişmendîya wan sûd bigirin.

Bi taybetî ew kesên bi zanebûn an bi nezanî demekî xwîn dane hêza xirabîyê, rê li ber xweşkirîne, derî li ber alternatîfbûnê girtine, mafê wan tune ye dijberîya rêxistinbûnê bikin.

Ew kes dikarin bi derbasbûna xwe re, bi ked û xebatên xwe re rûbirû bibin û muhasebeyek ûjdanî bikin. Divê bê zanîn ku bêhûqûqî û bêûjdanî ne karê welatparêzan e!

Bi kurtasî, divê hêvî û armancên me, helwest û bertekên me li gorî bingeha berjewedîyên netewî be! Divê em tu carî berjewedîyên partî, rêxistin, grûp, hizbî û kesayetî li ser berjewedîyên netewî negirin û rê nedin ku berjewedîyên netewî têk biçe.

Teknolojî nîmetek zêrîn e, divê em ji bo çekirin û avakirinê bi kar bînin. Jibîr nekin zimanê çêkir, hişmendîyek milî dikare sînerjîyek zîndî derxe holê. Ev jî girêdayî hewldan û kedek hevpar e!

Ji bîr nekin aqlê kurdî rê li ber desthilatdarî û destkeftiyên netewî xweştir dike. Aqlê îdeolojîk jî rê li ber derûnîya kerîyê kor û mirinê geş dike.

## Nerîna



**“Emmanuel Macron”:**

**“Em welatê xwe “deyndarê” Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) dibîne û wan bi tenê nahêl in”**



**“Donald Trump” :**

**“Em piştgiriyê didin her biryareke Îsraîlê ya derbarê muhleta azadkirina “hemû rehîneyan”**



**“Benjamin Netanyahu”:**

**“Trump bi nîqasên xwe rehînên Îsraîlî serbest berdan”**



**“Marco Rubio ”:**

**„ Em pabend in bi piştevaniya aramiya Herêma Kurdistanê û berdewamiya alîkariyên leşkerî bo wan”**

# Gelo dê çi biqewime dema ku Xamineyî bimire?!



**N. Eskender Ceiferî**



Tevî ku rêjîma dagirkar a Îranê ti caran nekariye Kurdbûna xelkê ji wan bistîne û tenê kariye axa wan dagir bike, lê Kurd bi hêvî ne ku piştî mirina Elî Xamineyî dawî li dagirkariyê bînin. Mirina dîktatoran, bingeha desthilata wan sist dike. Lê hin dîktator fikra piştî mirina xwe jî dikin.

Sipaya têrorîstî ya Pasdaran û eniya Rêformê take aliyên Îranê ne ku di hikûmetê de cih digirin. Baweriya her duyan jî bi sîstêma niha ya vî welatî heye lê dîsa jî di demên dawiyê de hevrikiya wan zêde bûye.

Her dema ku serokkomariya rêjîmê diket destên rêformxwazan, Elî Xamineyî rêberê rêjîma Îranê, gotarên xwe li hemberî endamên kabîneya dewletê tûjtir kirine. Li gor zanista siyasetê, her qasî ku gotara kesê yekem ê rêveberiya welat xuyatir, zelal û bê perde be, nîşana derketina aloziyan di navbera rêveberan de ye. Li Îranê jî heman tiştê dîtin.

Di hilbijartinên gerra yazdehem de Elî Xamineyî, bêalî bû. Lê di hilbijartinên gerra piştî wê ya serokkomariya Îranê de pişta Îbrahîm Reyîsî berendamê nêzî Sipaya Pasdaran digirt lê belê berovajî daxwaza Xamineyî, Hesen Rûhanî ji eniya Rêformê dîsa karî bibe serokkomar.

Cara piştî wê, Reyîsî bû serokkomar. Lê ew bi şêwazek bi guman hate kuştin. Pişt re dîsa kesê ser bi Xamineyî wate Mesûd Pizişkiyan bû serokkomarê rêjîmê.

Ji wê demê ve êdî Xamineyî, di gotarên xwe de dewletê rexne nake û kabîneya wî weke bêbandor binav nake. Berê di dema Rûhanî de, tevî ku Rûhanî nedikarî li hemberî Xamineyî derkeve yan jî ji siyasetên rêjîmê derkeve, lê belê daxwaza Sipayê tiştek din bû û Rûhanî diket ber rexneya Xamineyî. Bi vî rengî jî xuya dibû ku ciyawaziya Sipa û Rûhanî ji bo Kurdan nîn e. Tenê nakokiyên di navbera wan de bixwe hene.

Tirsa Xamineyî ev e ku êdî Rêformxwaz weke aliyekî mayînde bikevin dewsa Sipaya têrorîstî ya Pasdaran.

Hêzên nêzî Sipaya Pasdaran ku weke radîkalên şîe têne binavkirin, piştî mirina Xamineyî, êdî nikarin qet hevgirtî bin. Tê gotin perçebûna di nava wan hêzan de û nebûna dengekî hevpar, rêberê rêjîma Îranê ji bo qonaxa piştî mirina wî nîgeran dike. Di hember de, çend salan berê Elî Ekber Haşimiyê Refsencanî karî rêformxwazan li dora hev kom bike. Di wê gerrê de jî berendamê Xamineyî karî dengên wan hevgirtî û zengîn bike. Lê Sipayê dîsa jî nekarî vî karî ji bo hêzên xwe encam bide. Hilbijartinên wê carê yên Meclîsa Îslamî jî bi heman rengî bûn. Nakokî didomin lê sîstêm heman tişt e û baweriya her du aliyan bi heman sîstêmê heye.

Hikûmetên ku bi rengekî dêmokratîk nehatine avakirin, di qonaxa veguhestinê de serpêhatiyeke tal didin welatiyên xwe. Ji ber ku cîgir, tenê di riya desthilatê de tê destnîşankirin ne di riya dengdanê de. Piştî ku sala 2015’an neştergerî ji Xamineyî re hate kirin, êdî ew gihîşte ser vê baweriyê ku belkî temenê vê rêjîmê jî girêdayî temenê wî be. Lewma nîgeraniya wî zêde bûye.

Eger piştî mirina Xamineyî, rêjîma niha nemîne, dibe ku cugrafiya derewîn a Îranê jî yekperçe nemîne. Ji ber ku her yek ji neteweyên nefars weke Kurd, Azerî, Ereb û Belûçan jî mafên xwe yên netewî dixwazin û gelek partiyên cudaxwaz angu serxwebûnxwaz jî di nav wan de hene. Ew dibêjin bi vegera ser sindûqa dengdanê di Îraneke yekperçe de, dîsa jî her yek ji wan neteweyan ziyanbar dibe. Ji ber ku her yek ji wan li hemberî Farsan kêmîne ne.

Heya niha çendîn caran propagendayên derew li ser mirina Elî Xamineyî hatine belavkirin lê di rastî de piraniya wan, armancdar in. Sedema belavkirina wan propagendeyan, amadekirina welat ji bo qonaxa piştî mirina Xamineyî û perçekirina zêdetir a dengên Sipaya Pasdaran e ku xwe weke mîratgirê Xumeynî û rêjîma Îranê binav dike. Ev propagende dikarin rê ji bo perçekirina Îranê jî xweş bikin. Di encamê de dibe ku neteweyên nefars bigihin mafên xwe. Ji ber ku eger Sipaya Pasdaran û eniya Rêformê bikevin hevrikiyê, wê demê rê ji bo xebata her yek ji neteweyên nefars jî xweş dibe û di asta navdewletî de jî rê ji bo perçebûna Îranê vekirî dibe.


Refsencanî, weke cîgirê Xamineyî dihate binavkirin ku hem bandora wî li ser Sipaya Pasdaran hebû û hem jî dengên Rêformxwazan hebûn. Piştî mirina Refsencanî êdî bijardeyên din gelek kêm in ku bikarin weke Xumeynî, Refsencanî û Xamineyî, hemû hêzan bitepisînin. Her du meleyên bi navên Cennetî û Şahrûdî gelek pîr in. Reyîsî jî hate kuştin.

Lê tevî van sedeman jî, heke kesek bikare ji hemû wan astengiyan derbas bibe, dibe ku riya wî pişt re hêsan be. Ji ber ku sêyemîn rêberê vê rêjîmê, dibe xwedî sedan saziyan ku hemû wezaretên dewletê û Meclîsa rêjîmê biryara xwe ji wan distînin yan jî di bin çavdêriya wan de dixebitin. Rast e ku Xamineyî xwedî karîzma nebû û ji xeynî xwînrijekî hov tiştekî din nîn e, lê xizmê Xumeynî bû û di dema serokkomariyê de jî dengê her du aliyên dijber û razî, kiribûn yek.

Ji bo neteweyên nefara, tişta ku xuya ye ev e, heke ew xwe ji bo qonaxa piştî mirina Xamineyî amade nekin û hevgirtî nebin, dibe ku rastî gelek astengiyan bên.

# Serokê serîhildana miletê Kurd a 1925ê Şêx Seîd û hevalên xwe îro jî rêya me rohnî dikin

**Buroya Ragehandinê ya Partîya Welatparêzên Kurdistanê (PWK):**




Teşkîlata Azadiyê (Komîteya Îstiklalê) ya ku serokê wê Xalid Begê Cibrî bû, biryar dabû ku, bi amadekarî û xebateke sîyasî, leşkerî, civakî li Bakurê Kurdistanê serîhildanekê dest pê bike.

Dewleta Tirkîyeyê, bi vê biryarê hesîya û ji bo rê li ber vê serîhildanê bigire, berîya ku serîhildan dest pê bibe, Serokê Tevgera Azadîyê Xalid Begê Cibrî û rêvebirê Tevgerê Yusuf Ziya Beg girtin.

Di roja 13yê Sibata 1925an de jî, di demeke ku Şêx Seîd tê Pîranê, leşkerên Dewleta Tirkîyeyê dora wê mala ku Şêx Seîd û hevalên xwe lê dimînin digrin û dibin sebep ku şerekî mezin li wê derê derkeve û serîhildana bi rêberatîya Şêx Seîd bi vî rengî, ji wexta ku hatibû plan kirin zûtir û bi bê amadeyî destpê dibe.

Di demeke kurt de serîhildan li gelek bajar û deverên Bakurê Kurdistanê belav bû.

Lê ji ber ku serîhildan bêyî amadekarîyeke pêwîst destpêbibû, piştî du mehan, Şêx Seîd ji bo ku bikaribe hêzên xwe biser hev bîne, paş ve vekişîya.

Di roja 14yê Nîsana 1925an de Milazim Qasim(Binbaşi Qasim) ê hevlingê Şêx Seîd bû, Şêx Seîd û hevalên wî, li ser Pira Abdurahman Paşa ya ku li ser Çemê Mûradê ye xistin kemînê û li wê derê Şêx Seîd û hevalên wî teslîmî Dewleta Tirkîyeyê kirin.

Di eynî rojê de, di roja 14yê Nîsana 1925an de li gorî biryara Dîwana Herbê ya Bedlîsê, li Hefsa Bedlîsê Xalid Begê Cibrî û Yusuf Ziya Beg ji alîyê Dewleta Tirkîyeyê ve hatin kuştin.

Piştî biserneketina serîhildanê, 5.900 kes hatin darizandin, di derbarê 435 kesan de biryara îdamê hate dayîn.

Şêx Seîd Efendî û 46 hevalên wî di Mehkemeya Îstiklalê ya Şerqê ya Dewleta Tirkîyeyê de bi awayekî bêhiqûqî hatin darizandin û di roja 29ê Hezîrana 1925an de li Amedê li Qada Derîyê Çîyayî (Dag Kapı Meydanı) hatin darvekirin.

Mebûsê Dêrsimê Hesen Xeyrî Beg, Xaşid Begê Hesenanî li Elezîzê hatin îdam kirin. Ji wan kesên ku cezaya îdamê xwaribûn 100-150 kes nehatin girtin, lê yên din hatin girtin û îdam kirin.

Ev serîhildana ku bi serokatîya Şêx Seîd pêk hat, di encamê de bi qetil kirina bi deh hezaran Kurdan û bi şewitandin û wêran kirina bi sedan gundan di nav rûpelên dîrokê de cîhê xwe girt.

Dewleta Tirkîyeyê, heta îro jî cîhê mezelê Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî û Yusuf Ziya Beg û 46 hevalên wan veşartî hiştîne û nîşanî malbatên wan nekirine.

Serîhildan û Tevgera Kurd a bi serokatîya Şêx Seîd efendî, li dijî wê sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya ku miletê Kurd tune hesibandîye û xwestîye tune bike, nîşan û sembola rûmet û hebûna miletê Kurd bû, nîşana daxwaza mafên netewî û demokratîk yên miletê Kurd û nîşana dazwaza azadîya Kurdistanê bû.

Şêx Seîd serokekî netewî, olî û civakî yê miletê Kurd û yê kurdistanîyan e; rûmeta me ye.

Ew agirê ku Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Yûsûf Zîya Beg û hevalên wan ji bo azadîya miletê Kurd û kurdistanîyan pêxistibûn, ew hişmendî û hestên netewî, niştimanî yên Şêx Seîd efendî û hevalên wî , weke pêleke doza azadîyê berê xwe da Agirîyê, Dêrsimê, ji wê derê çûn Mehabadê û nuha jî li Hewlêrê li ser Parlamentoya Herêma Kurdistanê bûye ala serfirazîyê û li ba dibin.

Îro li Rojavayê Kurdistanê gelê me jibo destkeftinên xwe bipêrêze û ji bo berfirehkirina wan destkeftinên xwe, jibo mafên xwe yên netewî, kulturî û demokratîk têdikoşe.

Li Rojhilatê Kurdistanê jî agirê azadîyê di astên cuda û bi şêweyên cuda, bêwestan berdewam dike û geş dibe. Li Bakurê Kurdistanê jî eve 100 sale li himberî sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê ya li ser esasê înkar, îmha û asîmîlasyonê tê meşandin, têkoşîna azadîya milete kurd ya ji bo azadîya Kurdistanê ranewestîyaye.

Sîyaseta Dewleta Tirkîyeyê îro jî her li ser wê hişmendîya 100 sale berdewame tê meşandin. Em bangî Dewleta Tirkîyeyê dikin da ku dest ji wê sîyaseta xwe ya beyhûde ya înkar, îmha û li dijî kurdan berde û gavên ewil ji bo qebûl kirina nasnameya miletê kurd û bicîhanîna mafên wî yê neteweyî, demokratîk bavêje. Ji bo vê jî, divê dawî li şerê heyî, şîdetê û hemû çalakîyên çekdarî bêne anîn; divê bi hemû partîyên sîyasî û dezgehên sivîl ên miletê Kurd dîyalog bê destpe kirin.

Tecrubeya 100 salî ya Cimhûrîyeta Tirkîyeyê îspat kirîye ku, heta pirsa Kurd û Kurdistanê çareser nebe, dê li Tirkîyeyê jî azadî, demokrasî, edalet û wekhevî pêkneyê.


Di 100emîn salvegera destpêka serîhildanê de em Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Yûsûf Zîya Beg, Dr.Fuad û hemû rêvebir û beşdar û şehîdên serîhildanê û hemû şehîdên Kurdistanê bi rêzdarî bi bîr tînin.

Bi vê wesîleyê em careke din dîyar dikin ku divê Dewleta Tirkîyeyê cîhê mezelê Şêx Seîd, Xalid Begê Cibrî, Yûsûf Zîya Beg û 46 hevalên wan, cîhê mezelê Seyîd Riza û hevalên wî û cîhê mezelê Seîdê Nûrsî aşkere bike.

# Zihniyeta desthilata nû ya Sûriyê



**N. Ebdûlazîz Qasim**



Îro piştî borîna nêzîkî sê heyvan li ser rûxandina rêjîma Be'is ya Sûriyê, ku hêj ti pêşketinek berçav di rewşa Sûriyê de nehatiye pêkanîn, herwiha hîç asoyek ji bo siberoja Sûriyê zelal nebûye, zêdebarî ku her diçe rewş ber bi xirabiyê û korerêk û tunêlên tarî diçe, ji bilî çend axaftin û qiseyên xweş yên berpirsyarên deshilata demkî ku ew jî bi tenê dikevin çarçoveyê axaftin û daxuyaniyan de, lê li ser erdê ti wergêranek rastrast ji wan axaftinan re nehatiye cihkirin.

wek tê gotin (gotinên êvara dikevin qulên dîwara), berovajî ku bûyerên li ser erdê diqewmin wisa diyar dibe ku desthilata nû kar ji bo zêdekirina aloziyan dike ne ji bo çareserkirina pirsgirêk û aloziyên qeyrana Sûriyê, nemaze ku gelek pirsgirêk û kêşe li pêşiya rêveberiya nû ya Sûriyê hene, û belkî herî zêdetir pirsa çareserkirina pirsa kurdî û çareserkirina pirsgirêkên pêkhatiyên neteweyî û kêmatiyên olî be.

Îro tevî kêfxweşiya xelkê Sûriyê bi rûxandina rêjîma Be'is, lê herwisa tirsek mezin heye di nav xelkê de, ji ber girêdana desthildarên nû bi rêxistinên terorîst û tundrê re, nemaze ku desthilata nû heta niha hîç awirek raseteqîn nedaye bo çareserkirina pirsgirêkên serekî û xweşkirina barê jiyan û pêşkêşkirina xizmetgozariyê pêdivî bo xelkê Sûriyê.

Zêdebarî ku niha hizrên nijadprêsî û projeyên dijekurd têne xudankirin bi taybetî ji aliyê grop û rêxstinên girêdayî Exwan Mislimîn û Tirkiyê ve, tevî ku desthilata nû ya demkî di serî de pitir xemê dixwe li ser mijarên sepandina desthilata xwe û man û berdewamiya xwe li ser kursiyê desthilatê û herwiha derbarî çaresernekirina pirsa neteweyî ya kurdî jî bi awayekî berbiçav xuya dike ku zihniyeta wê gelekî dûr ji zihniyeta desthilata Be'is nîne, bi kurtî em dikarin di xwendina çend (kiryaran) de, dîmenên siyaseta destpêkî ya desthilata Sûriyê ya demkî berçav bikin:

**1-** di Roja 29.01.2025 de, di civîneke (leşkerî) de bi amadebûna çend rêxistin û gropên çekdarî di nav de hindek rêxistinên terorîst yên tawanbar bi komkujiyan li Efrînê, herwiha bi amadenebûna nûnerên kurd û Dirzî û Elewî û Kirstiyan ..., bi awayekî dûr ji prnsîp û alavên dêmokrasiyê û dûr ji biryarên Neteweyên Yekgirtî NU, Ehmed Elşerih wek serokkomarê Sûriyê bo qonaxa veguhêz hat destnîşankirin.

**2-** Damezrandina Artêşa Sûriyê ya nû bê beşdariya HSD, û dabeşkirina pile û postan li ser serkirdeyên çend rêxistinên çekdarî di nav de çend serkirdeyên biyanî (ne sûrî) tevlî serkirdeyên çend rêxistinên tawanbar bi komkujiyan li dijî Gelê kurd li Efrîn û Serêkaniyê û di serî de wekî tawanbar Mihmed Eleasim yê naskirî bi (Ebû E'mşe) û gelek tawankarên dîtir yên wekî (Himzat) ku dest hene di pêkanîna bi dehan komkujî û tawanên dijemirov li Efrînê û Serêkaniyê û Girêspî ...

Bi tevlîbûna tawankarên tawanên şer û djemirov di nav artêşê û hikumetê de, piştrast dike ku desthilata nû wê bi awayekî bihêz li dijî dadwerî û herwiha li dijî serweriya dadweriyê bixebite.

**3-** Şêweyê damezrandina (Komîteya Amadekar ji bo Konferansa Diyaloga Niştimanî" li Sûriyê di 11.02.2025 de, ku ji 7 kesan hat ragihandin û têde hîç nûnerekî kurd yan ji neteweyên dîtir yên cuda (ne ereb) nîne, bi tenê ji yekî rengê neteweyî hate pêkanîn bê liberçavgirtina pirrengiya neteweyî û ayînî û olî di Sûriyê de, tevlî daxuyaniya berdevkê Komîteya Amadekar; Hesen El-Dagim, ku:

ti kes bo konferans nayê vexwendin li ser bingehên ayînî, yan neteweyî mezhebî û hizbî".

Ev daxuyanî bi xwe redkirina mafên Gelê Kurd li Sûriyê ye, herwiha ku hemû biryarên derkevin ji konfrenasê dê bikevin di berjewendiya neteweya Erebî de û li dijî hebûna miletê kurd û li dij pirrengiya olî û civakî û netewyî de.

Bi berçavgirtina van xalan diyar dibe ku zihniyeta desthilata nû ya (Islama siyasî) dûr nîne ji zihniyeta desthilata berê (Şovenîzma Erebî) yan heman zihniyet e bi taybetî derbarî pirsa kurdî, lewra tê pêşbînîkirin berdewamiya kêşe û aloziyan wekî berê belkî bi awayekî dijwartir nemaze ku siyaseta dijminatiya Gelê Kurd ji aliyê Tirkiyê ve tê xudankirin û îro destê wê ji berê dirêjtir bûye di karubarên Sûriyê de.

# Hecetên pêdivî bo hêrişa ser Îranê





N. Elî Munezemî

Li wan rojên bihorî de bas li wê yekê tê kirin ku Îranê paşkevta ûranyûma meyandî a 60%, gihîştandiye 182 kîlo girem. Ewa li demekê deye ku paşkevta giştî ya ûranyûma Îranê li 6 tonan derbas bûye. Eger Îran her li ser wê esasê berdewam be, yê bo heyva adara 2025an bikare paşkevta ûranrûma 60% a xwe ya meyandî bigihîjîne 250 kîlo gireman. Li ber wê yekê niha serkomarê DYK – Trump – bas li wê yekê dike ku eger DYA û Îran nekarin rêkevtinek baş li ser pirsa bernameyên navikî yên Îranê bikin, egera hindê heye ku Îsraîl hêrişê bo ser Îranê û bi xasma li ser binkeyên bernameyên navikî ên wê rejîmê bike. Gelo li egera hêrişek han de bîrûraya giştî bo bi rewakirina wê hêrişê amade ye û yê wê hêrişê wek şerê rewa bihesibînin?

Armanc li şer xala serekeye bow ê yekê ku meriv biryar bide ka şerek rewaye an ne. Heke govannameya şer bikaribe aştî û aramiyê biafirîne, xûyaye ku ew şer rewaye. Her wek Agûstîn dibêje: "Em bo desteberkirina aştîyê diçin bo şer."

Bo bersivdan bi wê pirsê ku şerê Îsraîl yê bi Îranê re yê rewadar be yan ne, dibe em 3 qonaxan berçaw bigrin: a. rewadariya beriya şer; b. rewadariya li dema şer de û c. rewadariya piştî xilasbûna şer.

## a. rewadariya beriya şer:

Bo şirove rewadarî a beriya şer, dibe em şeş xalên sereke li ber çaw bigrin:

**1.** Hecet yan hegera şer: Ewa ku Îsraîl bi kîjan sedemê dixwaze hêrişî ser Îranê bike. Ewa ku Îran tunekirina Îsraîl bi armanca xwe ya sereke û bi serkê xwe yê olî-merivî dihesibîne, bes eger siberojê bikare çeka navikî çê bike, dikare bi wê çekê hêrişî Îsraîl bike. Her çawa li demên bihorî de heta niha 2 caran rasterast û eşkere ew hêrişa encamp daye. Bes eger Îsraîl hêrsih bike ser Îranê, ew yek bi sedema xwe-parastinê û ewa ku li zanistên siyasî de jêre dibêjin "hêrişa pêşîpêgirtinê", ew karê Îsraîl yê bi rewa bê zanîn. Li aliyek din, liberku xelkê Îranê rejîma Xumeynî naxwazin, lê liber nebûna îmkanan nikatrin wê rejîmê hiloşînin, hêrişa Îsraîl bo ser rejîmê dikare her wisa li rêza "desttêverdanên merivhezî" were danîn û li aliyê xelkê Îranê û bîrûraya giştî bi rewadarî were hesibandin.

**2.** Şer wek rêya davîn: Her wek ku Trump jî dibêje, eger Îran nekare bi DYA re bigihîje rêkevtinek baş, ew yek dikare Îsraîl mecbûr bike ku hêrişî Îranê bike. Yanî li pêş destpêkirina şer, rêka diyalogê bo rejîma Îranê vekiriye ku bikare xwe li şer bide qeraxê. Lê rêberê wê rejîmê – Xameneyî- rêkevtin bi her şêwazekê bi DYA re red dike û bi caran aniye ziman ku ew xwazyarê rêketin bi wan re nine. Bes şer wek davîn bijarde dikeve ber pêyên Îsraîl û ewan bijardeyek din nine.

**3.** Hisabkirina qazanc û zirarên şer: Hemû aliyek dizanin ku li egera gihîştina Îranê bi çêkirina çeka navikî, ne tenê Îsral, belkû merivahî di Rojhilata Navîn de dikeve tehlûkeyê. Li ber hindê jî eger Îsraîl bo sekinandina bernameyên navikî hêşrî Îranê bike, ewa bo parastina merivahiyê e li Rojhilata Navîn de û ew yeka yê li aliyê hemû welatên Rojhilata Navîn pêşivazî lê bê kirin. Ewy eka yê Îsraîl li ber çavên xelkê bike rizgarîker û ew yeka li berjewendiya netewî a Îsraîl de ye.

**4.** Hisabkirina şansê serkevtinê: Îsraîl pêştir bi hêriş bo ser sîstema bergiriya esmanî a rejîma Îranê, ew system lawaz kiriye û tecrubeyên hêriş bo ser Îranê jî hene. Li aliyek din, Îsraîl xwediyê çek û cebilxaneyê modern e. Li ber hindê, li serkevtina wan di şerê hember Îranê de şik û guman nine. Li aliyek din, ew li aliyê DYA jî têne saportkirin.

**5.** Nîyeta rewa: Rêber û karbidestên Îsraîl bi caran ew yeka anîne ziman ku ew dijî rejîma Îranê ne ku tunekirina Îsraîl xwe re kirine armanc. Îsraîl li tewî xelkê Îranê dijminayetiyek nine û wan dostê xwe dihesibine. Bes eger şerek jî dijî Îranê bê kirin, ew li dijî rejîmê e û bi nîyeta rizgarkirina Îsraîl û cîhanê e li dest wê rejîma hov de. Bes nîyeta wî şerî jî, nîyetek rewa ye.

**6.** Ûtûrîte yan desthilatdariya rewa: Îsraîl ku niha demokrattirîn hikûmeta Rojhilata Navîn e, desthilatdarî li xelkê wê ve serçave digre. Berevajî rejîma terorîstî a Îranê ku hikûmeteke totalîter û dijî hemû nirx û pirensîbeke merivahiyê e.

Bi kurtî derdikeve ku li qonaxa yekim bo destpêkirna şer de, rewadaiya wê bo Îsraîl heye û eger şer destpê bike, ew şer yê rewadar were hesibandin.

## b. rewadariya li dema şer de:

Bo ku em bizanin ka ew şer li rewta şer de, yê rewa be yan ne, dibe ew sê pirensîban lisber çav bigrin: a. Hevsengî, b. Cudakarî û c. Bandora du aliyane.

- Pirensîba hevsengiyê bikaranîna zêde ya hêza çekdar di dema şer de şermezar dike. Tê gotin ku armanca sereke ya şer (eger rû bide), hêriş bo ser binkeyên bernameya hajekî û navikî a Îranê e. Bes bo têkdana wan binkeyan hêza pêdivî yê were bikar anîn. Ewa li demekê de ye ku Îranê li dema hajekbarankirina Îsraîl, bi hemû hêza xwe hêriş kir.
- Cudakarî: ew pirensîb pêdagirê dike li ser wê hinê ku armancê sivîl û leşkerî li hev bêne cihê kirin. Îsraîl di hêrişa xwe ya wê daviyê bo ser Îranê da eyankirin ku ew di wî karî re şareza ne û ne tenê armancên sivîl li yên leşkerî cihê dikin, lê her li heman demê de wisa hêriş dikin ku kêmtirîn zirarên merivî hebe. Ewa li demekê de ye ku Îran bi heremekî hêrîş dike û kê ber bikeve, ne xema wan e.
- Bandora dualiyane: Ewa ku Îsraîl karekê neke ku hêcetê bide Îranê karek li wan xirabtir bike. Ew yeka jî li proseya nakokîyên navbera Îsraîl û Îranê de bi başî xwe nîşan daye. Îsraîl çi bike yan neke, Îran ewa ku destê wê tê dike û çi tiştî texsîr nake. Bes kar û kiryarên Îsraîl li dema hêrişê de yan jî hêriş nekirinê de, çi li kar û helwêsta Îranê beramber Îsraîl naguhere.

## C. Rewadarî piştî xilasbûna şer:

Ewa ku Îran nîyete xwe li şer dijî Îsraîl tinekitrina wê de dibîne, lê Îsraîl niyeta xwe ya di şerê hember Îranê lawazkirin yan nehêlana rejîmê de dibîn û dixwazin dostiniya navbera xelkê her 2 welatan dom bike, dide eyankirin ku niyeta Îsraîl piştî şer û nakokiyên bi rejîmê re rewadar û merivhezane ne. Bes bi kurtî em dikarin bibêjin ku li egera hêrişa Îsraîl bo ser Îranê, li niha de eyan e ku şerê wan yê bi dijî rejîmê rewadar were hesibandin û ew yek li berjewendiya xelkê her 2 welatan û merivahiyê bi giştî e.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Dayîka şehîdekî şoreşa Jînayê bo dadgeha rêjîmê hate gazîkirin



Dayîka Şehîd "Şehriyar Mihemedî" ku yek ji Şehîdên şoreşa "Jîna"yê ye, bo dadgeha rêjîmê li bajarê Bokanê hate gazîkirin.

Pêka gotina "Mîlad Mihemedî" yê birayê Şehîd "Şehriyar Mihemedî" xatûn "Mîna Sultanî", dayîka Şehîd "Şehriyar Mihemedî" ji aliyê dadgeha rêjîmê ve bi "teblîx li dijî rêjîmê" hatiye tohmetbarkirin û li derheq amadebûna jinan li rêpîvanan û derketin ber çavê xelkê bê hicab, lêpîrsîn jê hatiye kirin.

Li 27ê Rêbendana 1403 a Rojî ji aliyê taya 101 a dadgeha sizakirin a rêjîmê li bajarê Bokanê, haydariyek bo vê dayîka şehîd, şandiye

Şehîd "Şehriyar Mihemedî" yê temen 30 salî xelkê bajarê Bokanê, li pêvajoya tevgera "Jîna"yê de li 27ê Xezelwera 1401 a Rojî bi teqeya rasterast a hêzên tepeserker ên rêjîmê li bajarê bokanê hate şehîdkirin û termê wî şehîdî, li demjimêrên şevê û bi awayekî dûr ji çavê xelkê, bi axê hatiye spartin.

## Bidarvekirina girtiyan li girtîgehên rêjîmê berdewam e



Rêjîma Îranê li girtîgehên xwe li çend bajarên Îranê de zêdetir ji 4 kes bidar vekirin û girtiyek jî bi sedema pêrenegihîtina pizîşkî canê xwe ji dest da.

Pêka raporên belavbûyî, roja Çarşemî 24ê Rêbendanê, "Mehdî Şebexş Pîrsoranî" û "Teyib Cewadî" yê temen 35 salî ku bavê zarokekî ye, li girtîgeha Destgird a rêjîmê li bajarê Îsfehanê, hatine bidarvekirin

Herwisa rêjîma Îranê li roja Çarşemî 24ê Rêbendanê, kesekî xelkê Efxanistanê yê bi navê "Selman Hemderd" ê temen 30 salî, bi awayekî veşartî û bê hevdîtin digel malbata xwe, li girtîgeha rêjîmê li bajarê Birûcêrdê, ser bi parêzgeha Luristanê, hatiye bidarvekirin.

Roja Sêşemî 23ê Rêbendanê jî girtiyek ê bi navê "Cewad Kakawend" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Melayirê de hatiye bidarvekirin.

Roja 22ê Rêbendanê, li girtîgeha rêjîmê li girtîgeha Lakanê li bajarê Reştê de jî girtiyek bi navê "Behram Derwîşî" temen 31 salî yê xelkê "Koçisfehan"ê ser bi parêzgeha Gîlanê, bi sedema bêparbûn ji mafê çareseriya dermanî û zêdekirina nexweşiya wî, canê xwe ji dest daye.

Pêka rapoaran, hejmarek zêde ji nexweşan li girtîgehên rêjîmê bi taybet li girtîgeha Lakan a rêjîmê li bajarê Reştê û girtîgeha Şîbanê li bajarê Ehwazê de hene ku hewcehiya lezgîn bi derman û çareseriya pizîşkî hene, lê rêjîmê ev girtiyên nexweş ji mafî tedawî û dermanî bêpar kirine.

## Du ciwanê Kurd ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê ve hate girtin



Li berdewamiya binçavkirina xoserane û bê belgeya yasayî ya welatiyên Kurd, vê carê jî hêzên hov ên îtilaata rêjîmê li bajarê Ciwanroyê, welatiyekî xelkê wî bajarî binçav kirin û bo ciheke nexuya veguhastin.

Pêka raporên belavbûyî roja 23ê Rêbendanê, li demjimêrên şevê, hêzên hov ên îtilaata rêjîmê li bajarê Ciwanroyê de ciwanekî xelkê wî bajarî yê bi navê "Yehya Muradî" bi awayê xoserane û bê belgeya yasayî binçav kirine û bo ciheke nexuya veguhastine.

Pêka wan raporan, hêzên hov ên îtilaata rêjîmê bo girtina "Yehya Muradî", êrîş kirine ser mala wî welatiyê Kurd.

Navbirî li 26ê Xezelwera 1398 a Rojî de jî ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê ve hatibû binçav kirin. Heta belavbûna vê nûçeyê sedema binçavkirina xoseraneya Yehya Muradî û tohmetên sepandî bi ser wî welatiyê Kurd û cihê ragirtina wî, nehatiye zanîn.

Herwisa roja Çarşemî 24ê Rêbendanê, Diyako Xizrî yê xelkê Şîlanawayê ser bi bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê ve hatiye binçavkirin û bo ciheke nexuya hatiye veguhastin. Navbirî mamê şehîd "Şaho Xizrî" ye ku li tevgera "Jin Jiyan Azadî"yê de hate şehîdkirin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (488)